




KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ / HUMORISTISK KURDISK TIDNING



KOVARA WE JI DU  
MEHAN CAREKÊ DERTÊ

VARANNAN MÂNAD  
KOMMER UT

hejmar : 6

ÇIRIYA PEŞÎN 1986



KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ  
HUMORISTISK KURDISK TIDNING  
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE  
OCH REDAKTÖR:

MAMOSTE

KWEDÎ BERPIRSIYAR  
Û REDAKTOR:

MAMOSTE

NAVNÎŞAN / ADRESS:  
c/o Gezgin  
Axbyplan 5  
163 73 SPÅNGA/SWEDEN

BUHAYÊ WÊ / PRIS:  
10 Skr. 10 Ff, 3 DM.

ABONA SALEKÎ : 70 Skr.  
PRENUMERATION: 70 Skr.

TFN: 08/760 81 23  
POSTGIRO: 496 09 75-6  
ISSN: 0283-099X



KURD Û KURD JI BO KURD

Jinebiyeka bi du zarokan û mērebiyekî ku sê zarokên wî hebûn bi hevdû re zewicîn. Di navbêra zewaca wan re nehdeh sal derbas bû, du zarokên wan jî hevdû çêbûn.


Rojekê wexta ku zarok li bexçe bi hevdû re dilîstin, di navbera wan de şer derket û bi nav-hev ketin. Jinikê di pacê de wan dît, bi gazî û hewar bangî mērê xwe kir û got: Mērik! Mērik! Were li vî halî binêre. Zarokên MIN û zarokên TE bûne yek li zarokên ME dixin!...

Nizanim ev mesele ji bo me Kurdan jî di cî de ye?

Belam em dibihîzin, ku di şerên navbêra Îran û Îraq'ê de Kurdên me pir zîrek in. Hinek ji wan bi mēranî êrîş dibin ser Îraq'ê (nav Îraq e, lê cîhên şer Kurdistan e) û hinek jî bi pehliwanî êrîş dibin ser Îran'ê (nav Îran e, lê cîhên şer Kurdistan e). Gelo ev Kurdên me, li hember kê, ji bo çî û li ser kîjan erdî şer dikin? Telef, telefên kê ne?

Wek li jor hatiye gotin, lê bi haweyekî dîn: KUDÊN me û KURDÊN wan bûne yek li KURDAN dixin ji bo xelasbûna KURDAN!... Rast e yan na?

ÎSOT



Ji ruyê çewt qopiya kişandinê wê Kakacanê me, îsal dîsa cotdirûn bike.

Lê emê bersîvên rast bidinê, belkî mamostê wî, wî bihêle îkmalê. Em çabikin, ev tenê ji destê me tê.

Kakacan, hejmara doktoran li Diyarbekir'ê ne 10 000 in. Di

Yurt Ansîklopedîsî de dibêje ji 10 000 merivan re doktorek dikeve. Çima çewt dikşîni?

Kak ne Beriyên Dîcle ye navê wê Deştê Silîva ye û ne Rûbarê Embarê ye,

Çemê Embarê ye.

Lê ez bersiva hemuyan nadim, hinekî jî tu li dersa xwe bixebite.

MÛÇERVANÊ ÎSOTÊ DI ŞERÊ HERBA ÇEKEMÎT DE LI HEMBER JIN Û DÛKTOREKAN



## MERHEBA ISOT

Ez dixwazim ji we re pêşniyarekê bînim. Wek hûn dizanin (an nizanin) li Swed têt-kiliya me bi însanê sê mileta re heye. Em bi kêmasî bi sê zimana dipeyîvin, dixwînin. Lê belê ÎSOT tenê bi zimanekî têt çapkirin.

Ger hûn karibin Îsot'ê bi aweyekî wusa derxin ku bi sê zimana bê fehmkirin. An qursekê vekin ji bo zimanekî nu û her merivê here qursê 400 kronî bidinê, wê ku ji kêfa peran be jî herkes zimanê Îsot'ê zû hînbibe. Wê demê herkes kare bi aweyekî xweş Îsot'ê bixwîne. Ji bo vê yekê ezê mîsalekê bidim, belkî hûn karibin Isot'ê li gor vê çêkin û hewceyî tu qurs dayînê nebe.

Li gundekî Berî yê zilamek hebû, navê wî Hemkê bû. Du heb jinên wî hebûn, yek ji van Kurd, a din jî Tirk bû.



Rojekê Hemkê diçe aşê û genimê xwe dihêre. Di vegera malê de, du meriv dertên pêşiya Hemkê. Arvanê wî jê distînin û Hemkê me ji lêxistinê dixin halekî xerab. Wexta Hemkê bê arvan têt mal, herdu jinên wî bi qêrîn û hewar têt pêşiya wî û a Tirk dibêje:

-Hamît'cîgîm ne oldu, kimler senî bu hale soktu? Bî xelaskirina wê re a Kurd dibêje:

-Ma kê li te wer kiriye! Ma kanî arvanê te Hemkê min?


Hemkê ji bo dilê herdu jinkên wî jê nemîne, bi zimanekî weha bersîv dide.

-Ez çûm aş û degirmen, hat pêşiya min diz û hirsiz, lêxist baş û serê min, ji mî stend arvan û unê min.

Jinên Hemkê herduya bi hevdu re meselê her yekê bi zimanên xwe fehmkirin.

Di xweşiyê de bimînin.

RUKEN




(ES)KERIN TIRK BI PAVEN  
RASTI DIZEN HEKA  
DISA LI ULUDERE'YE  
KOPEN XWE DAPIN.





MİN HÊKEK  
DÎN ÎÎ DÎT



MİN ÎÎ DU  
QALIB SABÛN  
DÎT.



HICUMMMM...



'EFERIM, 'EFERIM  
EZ SIBE JÎ HEWQASÎ  
DIXWAZIM.

QUMENDANIM JI XEVNÎ MÊR  
Û ZAROKAN, ME ÎRO SÊ BERXIK  
LEH MURÎŞK Û HEŞTÊ HÊK TOPKIRIN.

@ PÎROZ BE!

Hinek Kurdên me li Ewropa'yê pir zîrek in. Axleb jî vanên bi navên hunermend û pispor tên naskirin (wek dîktor, awukat, dîrokvan, nivîskar û hwd.).

Vana ji bo Kurdan pir muesesên mezin çêdikin û dixin xizmetê. Tiştên wan hemû ji bo Kurd û kurdayetiyê ye. Wek Enstîtuya Kurd, Akedemiya Kurd, Ajansa Kurd, Unîversîta Kurd, Proja Kurd û hwd.


Belam ku tiştên weha mezin ji destên me nayê, me tişteki biçûk çêkir. Lê em hevîdarin ku wê xizmeta wê mezin be. Ev muesesa me bi navê xwe Nexweşxana Kurd e. An bi aweyêkî din Tîmarxana Kurd e.

Ji ana ve Tîmarxana me ji alî endmên meyî tabîî (hinek pispor û hunermend) ve tije buye. Em nizanin wê kê, vanê li derveyî Tîmarxana me mane tîmar bike.

Em li hêviya alîkarî ya we ne...

ISOT AKTIEBOLAG





MIRTIB Û KEMAŒA WÎ

Mêrikê mirtib, li dîwana axê nêzî ber derî di nav şekala de rûniştibû. Cem'at xwest ku ew hinekî ji wan re li kemaŒe xe. Mirtibê me kemaŒa xwe derxist pêşî xwest dûzenê (aqord) bidê. Dest bi xze-xîzê kir, lê wek dilê wî dixwest kemaŒe deng dernetixist. Di wê demê de çima ba ji ber jinka wî neçû! Rebenê Mirtibê me zer bû, çilmisî ma. Lê cem'at qet xwe lê nekir hay, wek tişteke nebûbe guh da Mirtibê me. Mirtib ji şerma ruya hew karibû kemaŒa xwe têxe dûzenê û deyax nekir û got:  
-Ez li ku dixim, deng ji ku dertê.



ÎSOTÊ BIXWÎNE,  
LÊ PEDE XWENDIN!



EWÊYA DEYNE VIR  
Û HERE BA MEMUR BEG.

1

**BERTÎL  
RUŞVET  
AN  
XOKÎ**



XATUN!.. TIRŞIKÊ  
JÎ TELEBA RE ÇÊKE  
JÎ RÊYA DÛR HATINE.



EWÊYA DEYNE VIR  
Û HERE BA MIDUR BEG.

2



TU MERIVEKÎ PIR ZANE  
Û QENCÎ. WERE PARTIYA ME  
EZÊ TE TÊXIM LICHA MERKEZÎ

BAŞ E. LÊ EZ  
NIZANIM BI  
XWENDINÊ...



TE TÎRO ŞEKIR JÎ MÎN  
RE NE ANIYE. EZ  
PAMÊLIM TU WERT  
DIBISTANE



EWÊYA DEYNE VIR  
Û HERE BA QEYMEQAN  
BEG.

3



KU TU QÎZA XWE  
BIDI MÎN, EZÊ BÎST  
DOPUM ERD BIDI  
TE.




EWÊYA DEYNE VIR  
Û HERE SIBÊ WERE

4



'EFERIM JÎ MÎN RE!  
DI DU HEFTA DE KURÊ  
MÎN BÛ XWEDÎ CUZDAR

5



Matthias



Bêrîvan (Arzu) ji zirrîniya telefonê re hişyar dibe û dibêje:

-Elo, ez Bêrîvan.  
Yê ku telefon dike Şîrîn e (Sevda).  
-Roj baş Berîvan, ez Şîrîn im. Ma tu hîn uykuda bû ke-  
çê?  
-Ez yatmiş nekîm lê çi bi-  
kim.  
-Çi ma, çi bû, yan jî te bi  
Şoreş ve pevçûn kir???  
-Ez pevçûn nekîm lê kê bike!  
-Bêje hele, dibe ku ez bika-  
rim alîkarî etmişkim.  
-Hoya (sebeba) pevçûn û bê-  
tamiya di nav mala me de î-  
sot e. Mêrê min dibêje ca-  
rek din gerek ÎSOT nekeve  
mala me. Dibê ew pir tûj e.  
Dev û mala me şewitand. Xu-  
setê me xirakir. Mêr û jin  
berdan hev. Nerindiyên me  
derxistin ber çavan. Lê ta-  
ma wê di devê min de ye û  
navê wê di dilê min de ye.  
-Bi serê te rewşa me qet jî  
ji ya we baştir nîne.

KOLIKÎ

Lawik ji bavê xwe pirsî:  
-Bavo, Pêşmerge çi ye?  
-Ma tu nizanî?  
-Na!

-Çawa na! Min ji te re bi  
hezar caran gotiye pêşmer-  
ge, ap û pismamên te goti-  
ne pêşmerge, xaltî û amo-  
jinên te gotine pêşmerge.  
-Bavo, bi serê te, ez dî-  
sa jî nizamim pêşmerge çi-  
ye.  
-Wê demê di serê te de me-  
jî tune.  
Jina mêrik rehet nekîr û  
got:  
-Hey gidî, çi ma tu lawik  
re nabêjî rindik, rindik.  
Ew kesî ku di pêşde diçe,  
her tim li pêşe, ji miri-  
nê natirse, tirs nizane  
re dibêjin pêşmerge.  
-Tu rast dibêjî jinik. La-  
wê min, pêşmerge min, tu  
neha zanî pêşmerge çi ye.  
-Ez zanim.Û ez dizanim ku  
ez jî ne pêşmerge me.  
-Ji bo çi kuro?  
-Ji bo ku ez di pirtûka  
xwe ya matematîk de paşde  
ma me. Sûretê xweşik nika-  
rim çêbikim, ji bo vê jî  
mamostê min dibêje "tu ge-  
lek paşde mayî".

Di bazdan de dîsa ez her  
tim li paşim. Welatê me jî  
bindeste, miletê me jî paş  
de maye. Bi rastî ez gelek  
jî ditirsim. Eger ku netir-  
sonekbûma ez dê di şerda  
bûma.


Ka, nabînî? Li Swêd rewşa  
me "baş e". Ji bo vê ez ne  
pêşmerge me.

KOLIKÎ



TU KARÎ HINEK PERE  
BI DEYR BIDÎ MIN, JI BO  
ENFLASYONÊ.








Di vê hejmarê Isot'ê de jî, emê karîkaturîstekî li Kurdistana Tîrkiyê hatiye dinyê pêşkêşî we xwendevana bikin.


ALP TAMER ULUKILIÇ

Alp Tamer Ulukiliç 1952' de li Bîtli's'ê hat dinyê. Di Istenbol "Güzel Sanatlar Akedemisi" de xwend.

Alp Tamer, nuha di kowara "Gırgır" û "Fırt"ê de karîkaturan çêdike.



# CALIM ŞEWQÎ



"Romaneke şoreşgerî muheqeq di navbêra 1961-1971'de gerek bi Türkiye İşçi Partisi (Partiya Karkerên Tirkiya) destpêbika. Çimkî hima, hima herkes bi TÎP ê destpêdika. Ji bo romaneke şoreşgerî 100 gram TÎP lazim e. 70 gram jî Dev-Genç. Paşê jî 80 gram ji gerîlayê gund (beyar : kır) re şelaqî û durûtî. Hemû bû 250 gram. 150 gram jî ji Henry Miller a serîa Seksus-Neksus-Peleksus bê deynkirin, romaneka şoreşgerî tê nivîsandin." (Yalçın Küçük)

Ev ji bo romaneka şoreşgerî a ku hunermendên Tirkan ên zane û nivîskarî re lazim e. Kurdên me hê negihîştine merhelak weha, lê dest bi nivîsandinan çîrokên kirine.

Nizanim gelo çend sed gram ji wan re lazime?

Ku meriv çîrokên nivîsandî ên Kurdên meyî nivîskar bijmêre digîje netîceyek wusa ku: çîrokên wanî çapkirî ji yên wanî ku xwedîne pirtirin!...

Gelo li tu welatekî din tişteki eweha heye?

# EWLIYAKÎ XWEDÊ



Pasdarek ji pasdarên Xumeynî Xefur Xeyale di şerên navbera Iran û Iraq'ê de nehatibû kuştin. Bi gotinek din çerxa felekê lê nekeniyabû. Ji bo vê yekê Xefur Xeyale, destekî xwe dabû bin çenga xwe û hungir hungir digiriya.

Hevalekî wî jê pirsî:

-Çima tu weha wekî pîrekan digirî û hêsiyan dibarînî?

Pasdare me Xefur Xeyale deng nedibir xwe, ji alîkî ve li singa xwe dixist û bi 'ore 'orekê giriyê xwe domdikir, ji aliyê din ve jî serê xwe ber bi asîmana ve bilindikir û digot:

-Xwedayo! Xweadayo ma gunehê min çî ye? Çima te ez şehît

nexîstîm? Dixwazim ku tu anu ha hema li vir vî ruhê minî bê qiymet ji min bistînî, min şehît bixî!...

Hevalê wî hew de yax kir, rahişt tivinga xwe û berê lûla tivinga xwe li pasdarê meyî Xefur Xeyale rastkir ku wî ji vê 'ezabê xelas bike. Wexta pasdarê me devê lûla reş dît û nihêrt ku hevalê wî bê henek tivingê lê rastkiriye, ji tirs mirinê di cîhê xwe de sar bû ma. Piyên wî sist bûn û lerz bi dev û diranan ket, rûçikê wî çilmissî ma'dê wî sipîçolkî bû û wusa ma. Xwest ku bêje "Ez ketime bex tê te, tu mi nekujî", lê çî feyde devê wî hew digeriya. Xwest destên xwe bi alî hevalê xwe ve bilindke û bi destan bêje "mi nekuje", lê ji

tirsan taqet jî ji destên wî kişiya bû. Ji tika tika dilê xwe, xeriqî û di cîh de can da (ruh da).

Hevalê wî êdî hewce nedî ku tivinga xwe bîteqîne. Devê lûla tivinga xwe xwarî 'erdê kir, di ber xwe de mijulî û got:

-Ev Xefur Xeyale çî ewliyakî Xwedê buye! Çî merivekî salih û mezin e. Binêre Xwedê yeka wî nekir dudo, duayê wî di cîh de qebûl kir. Di derbekê de bê êş û gazin ruh jê kişand. Wî gihand merteba şehîdan. Gelo meriv çewa bike ku bigîje merteba Xelîl Xeyale?

Paşê serê xwe hejand. bê hemdê xwe bi dengê bilind got:

-Peeeh! Çî ewliyakî mezin bû.


# KURDER

Di suîkasta li hember Pînochet li şilî yê çêbû, li gor polîsekanê Swed tiliya Kurda têde heye. Ma ne Kurd in. polîtîka ya dinyê ji wan tê pirsîn.

Polîsekanê Swed bi rojane li ber datayên (qompîtor) xwe sekinîne û malumatan kontrol dikin. Li gor îxbarê gayrî-resmî polîsekanê Swed weha dibêjin:

-Pînochet di 11'ên îlonê de hat îktîdarê. Ev tiştê gelek muhîm e. Muhîmiya wê ji vir tê. Piştî 11'ê îlonê, 12'ê îlonê tê. Di navbêra wan de tenê şevêk heye. Gelo çima şevêk tenê? Gerek meriv bifikire. Di 11'ên îlonê de Pînochet û di 12'ên îlonê de jî Evren hat îktîdarê. Himm çewaye! Hûn dibînin Kurd çewa planê mezin çêdikin. Belkî we pê dernexist, bisekinin em bêjin.

Kurd ji bo çavên Evren bitirsînin pêşî li şilî yê suîkast çêkin... Her çiqas kêmasî di fikrên me de hebe jî, lê em li ser şopa rastîn. Ma ku çewt derê wê çî bibe? Qet!... Ma ne Kurd in.



LI GOR NÛÇEYÊ ME JI GUHDAR  
PRESS'Ê STENDIYE :

KOVARA MÎRKUT HEJMARA DAWÎ  
ÎLLEGAL (SIRRÎ) DERKETÎ YE. JI BO  
VÊ YEKÊ JÎ, JI NIVÎSKAR Û XWEDÎ  
YÊ WÊ PÊFTIR KES NIZANE ÇI DI  
PAVEROKA WÊ DE HEYE.

KOVARA ZENGIL JÎ, BI PAVEKÎ  
DIY DI ÎLONÊ DE DEST BI WEŞANA  
XWE DIKE...



XWENDEVAPEKÎ MÎRKUT'Ê

# QEHREMANE BÊ NAV



## Smet från

En turkisk diplomat hotade i går natt i Stockholm nattklubben Alexandras dörrvakt till livet.

Genom att under kavajen blotta en grovkalibrig revolver försökte mannen smita från en obetald nota på 350 kronor.

Diplomaten riskerar nu att utvisas ur Sverige.

Aftonbladet rapporterade om händelsen i sin...

GUHDIREJÊ ME BÎ VEXWARÎNA  
ÎSKANEK ŞERAB DEST BÎ BÎR-  
ANÎNÊN XWEYÎ "ŞARQ XÎZMETÎ"  
KÎR!..



KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ  
HUMORISTISK KURDISK TIDNING  
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE  
OCH REDAKTÖR

: MAMOSTE

ADRESS

: c/o Gezgin, Axbyplan 5, 163 73 SPÅNGA

BUHAYE WE / PRIS

TEFN: 08/760 81 23 POSTGIRO: 496 09 75-6

: 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. PRENUMERATION 70 Skr

ISSN: 0283-099X